

Hêj xelkê Hesekekê ji nebûna ava vexwarinê dinalin

Kurdistan Îmad Fexredîn



Xelkê bajarê Hesekekê hêj ji nebûna ava vexwarinê dinalin, û ev dema zêdetirî 15 rojan e bê av in, xelkê bajar jî ji

bo dabînkirina avê berê xwe didin kirîna ava paqij û wek ew dibêjin jî ava bîran ne paqij e. Welatîyekî bajarê Hesekekê ji Rojnameya

Kurdistan re wiha dibêje, ava bîran nayê vexwarin, û ne ji bo şuştinê dibe, lewma ew berê xwe didin kirîna avê û ev yek jî bargiraniyeke

zêde ye li ser wan ji ber ku rewşa abûriya wan zehmet e, heta niha rêveberiya PYDê jî nikare vê pirisgirêkê çareser bike, ew dibêje

grûpên çekdar ava Elokê qut dike û ew jî dibêjin PYDê elikitrîkê qut dike û yê zîyanê dibînin xelkê sîvil in. welatîyek din dibêje

ew di nava du agirana de ne û bê av in, heta niha tik e sbi hewara wan ve nayê, lewma daxwazê ji Civaka Navdewletî dikin alîkariya wan bike.

Divê bi çi şeweyî be danûstandinên Kurdî Kurdî biserkevin

Kurdistan-
Mecdel Mehmûd

Ev demeke hejmareke serkirdeyên Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD behsa rawestandina danûstandinên Kurdî-Kurdî dikin û hin ji serkirdeyên Partiyên Yekîtiya Niştîmanî jî vê yekê red dikin, lê ev yek bûye cihê nîqaşê li cem çavdêran, hin dibînin ku di nava PYNK de gelek serî hene û hin ji wan jî dibêjin destêwerdana PKK dihêle ku astengî ji danûstandinan re çê bibe û ev daxuyanî werin dan, lewma pêwîst e Amerîka fişarê li vî alî bike da ku van daxuyaniyan rawestîne.

Endamê Desteya Serokatiya Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) Mihemed Îsmail li ser diyaloga Kurdî-Kurdî ragihand: "Diyaloga Kurdî-Kurdî berdeamiya wê heye, qet nehatibû rawestandin, ji ber ku nûnerên Amerîkayê yên li vê derê hatin guhertin, yên ku berê li vê derê bûn, çûn. Heta nûnerên nû hatin, stratejiya xwe ya nû danîn, li ser vî esasî niha dê dest pê bikin. Ji ber vê yekê jî diyaloga Kurdî-Kurdî nehatiye rawestandin û ti aliyekî jî negotiye hatiye rawestandin."

Endamê Desteya Serokatiya ENKSê Mihemed Îsmail ji Kurdistan24ê re li ser naveroka civîna ENKS û şanda Amerîkayê axivîbû. Mihemed Îsmail êşkere kir: "Îro Balyozê nû yê Amerîkayê bo rojhilatê Sûriyê hatibû vê derê û ligel şanda Encûmena Niştîmanî ya Kurdî (ENKS) civatek pêk anîn. Destpêkê pênasîn bû, her aliyek hevdu nas bikin, cara ewil e



ew tê Sûriyê." Îsmail diyar kir ku Balyozê nû yê Amerîkayê bo rojhilatê Sûriyê stratejiya xwe da xuyakirin ku dê bi çi şewazî vê danûstandinê bike û got: "Tekez kir ku Amerîka aliyekî garantîdar e di vê danûstandinê de, di vê diyalogê de û dê guh bide her du aliyên û hewl bide alîkarî bi wan re bike ku çawa kêşeyên dirust bibin,

werin çareserkin." Endamê Desteya Serokatiya ENKSê ragihand: "Me tekez kir li ser xalên Encûmena Niştîmanî ya Kurdî ku cidî ye, dixwaze berdeamiya vê diyalogê hebe heta bigihe encamên baş, me pêwîstî pê heye, miletê me jî pêwîstî pê heye û eger destkeftê hebe, dê di berjewendîya hemû aliyên de be." Derbarê naveroka civîna de

êşkere kir: "Ti axaftin û danûstandin li ser diyalogê çênebû, weke min got; pênasîn bû." Li ser pirsê "Gelo di civînê de hate diyarkirin ku Amerîka rijd e li ser diyaloga Kurdî-Kurdî pêk were û Amerîka rola xwe di vê diyalogê de bibîne?", Mihemed Îsmail êşkere kir: "Belê, tekez kir ku li ser asteke gelek bilind Welatên Yekgirtî yên Amerîkayê ji Wezîrê Derve heta dawî

berpîrsên dosyeya Sûriyê, hemû mijûl in û guhdar in û piştvan in ji bo ev diyalog bi ser bikeve." Mihemed Îsmail diyar kir: "Eger Amerîkayê nûnerêkî taybet, balyozekî taybet destnîşan kiriye ji bo vê deverê, ev nîşaneyên girîngiya guhdana Amerîkayê ye ji bo mafên vê derê." Endamê Desteya Serokatiya ENKSê got: "Diyaloga Kurdî-Kurdî berdeamiya

wê heye, qet nehatibû rawestandin, ji ber ku nûnerên Amerîka yên li vê derê hatin guhertin, yên ku berê li vê derê bûn, çûn. Heta nûnerên nû hatin, stratejiya xwe ya nû danîn, li ser vî esasî niha dê dest pê bikin. Ji ber vê yekê jî diyaloga Kurdî-Kurdî nehatiye rawestandin û ti aliyekî jî negotiye hatiye rawestandin." Mihemed Ehmed wiha li ser vê mijarê dibêje, Nabe ev danûstandin bi çi awayekî be werin rawestandin, û divê welatê garantîdar ku Amerîka ye fişareke zêde bike da ku danûstandin berdeamiya bikin, niha çavê hemû xelkê Kurdistanê Sûriyê li vê gava pîroz in, lewma çarenivîsa miletekî li ser van danûstandinan e, û yê ku xwe jê birevine dê dîrok wî siza bike, niha em dibînin PYD xwe direvine û ev yek jî bi piştvanîya Partiya Karkerên Kurdistanê PKK ye ku ew naxwaze ev yek biçê serî ji ber ku ew sûdê ji xerabiya rewşa Kurdistanê Sûriyê dibîne. Candar jî wiha dibêje, nizamî çî bêjim serkirdeyê HSD ku Mezlûm Ebdê tiştêkî dibêje û Aldar Xelîl û çend kesayetiyên din tiştêkî din dibêjin, ev jêre dibînin durrûtî, divê bi rsatî ev alî xwe yekalî bike, yan dê van danûstandinan biser bixe yan xwe vekişîne, ew herdem pirsê pêwîstiyên Encûmena Niştîmanî ya Kurdî ENKS ligel Tirkiyê dikin hincet, û heger bi dest wan ketiba nedigotin na û bi bazdan çûbûna Enqera. Ev partî naxwaze rewşa Kurdistanê Sûriyê baş bibe û dixwaze herdem alozî hebin da ku sûda xwe jê wergire, û em vê yekê li ser erdê jî dibînin.



PKK çî ji Kurdan dixwaze




Mahir Hesen

PKK xwedî girîngiyek bingehîn e li ba dewletên dagîrker , ku encamên destwerdana pkkê a berferh tenê bi ser kurdan de dirjî. nemaze di warê amadekirina danîna van gişt pîvanan di çarçoveya stratejîyê bo wêrankirina destkevtiyên kurdan. ya girîng ev e ku meriv hin gavan pêşwext plansaz bike û hemberî gij û tûjiya pkkê bi mêrxasî û qehremanî bisekine û bersiva bide.

Dema ku mirov li plansazkirina êrişên leşkerî ên pkk li dijî hikumeta herêmê binere , xweş têk digihe ku armancên pkk yên bi rêkûpêk diyarin , û siyasta wa bi hevahengiye û li gor daxwaz û xwestekên dagîrkeraye Ji ber ku armanca xweya sereke , zêdekirin û paşvexistina bêbaweriya Dewletan bi siyasta herêmê ye . Dibe ku ev têkbirina herêmê armanca wa ya sereke be. Nêzîkatîyê stratejîk a firehtir dikare bibe armanca ji bo guherandina hevserîyê hêza netewparast wek mîna PDK . bi vî rengî dixebite wê bikişîne û wê bi xirabî li nav alîgir û hogirên xwe şîrove dike .

Ji bo ku êrişa wa bi bandor be, li ser tunebûna çavkaniyên mezin ên hêza ku Herêma kurdistan pê ve girêdayî ye dilivin . lêbelê, xalek diyar heye ku ji derveyî wê PKK neçar bimîne , ku

endam û piştgirên wê li başûrê welat bêne dadkirin . Çima dive ku sînor bo pkkê hebe ?! Gelek şîrovkarên siyasî dibêjin her ku PKK ji mijara rûreşkirina xwe derbas dibe jî, guman heye , pêşandana kurdayetiya rast bandorek li ser siyaseta wê kiriye . Rast e , lê em dibêjin konseya pkk serkirdeya wê tirk e , û divê meriv hertim amade be ku ev dibe sedema encamên nexwestî yên wekî qurbanîyên sivil an hesabên çewt. Mînak tişt a îro li silêmanîyê diqewime ? ji ber vê yekê divê were pejirandin ku pkk tirsek e , merivan ber bi rêyek çewt ve dizivirîne û ji bo amadekirina kûr û berfireh li ser weşandina netew û ramanê dewletbûnê di hişê kurdan de biherşîne . hewildana pkk bi xapandina xelkê bi gotinên serfirazî û serdestî wekî hincetek tête pejirandin da ku daxwazên xwe



di meşandina şerê kurdan de piştrast bike, bi vî rengê komkujî û tawanên dijî civakî û dijî şoreşa pêşmerge li deverên kurdistanî , him jî dijî serhildêran ji xwe re rew a dike, di heman demê de sedemên ên rûmet û serweriya neteweyî, bersivê bi êrişên dubare ser dike û pêşî li dubarebûna wan digire. Tevî êrişên pkk yên li dijî deverên hestiyar di herêma kurdistanê de dest pê

kir, hikumeta me ya li başûrê welat bersiva yek ji wan tewanan neda, û wusa dixuye ku ew di şerê birakujî de gavek jî na baveje , naverok- her carê - ku bi daxuyaniyan dijî kiryarên pkk bersiv dida. lê pkk dixwaze pdk bikişîne nav şerekî. Belê eşkere dike ku siyasetmedar û kadiroyên pkk ji bo parastin û xurtkirina berjewndiyên xwe bi kurda ketine , û wext ji dest xwe bernadin,

ku tê vê wateyê ku ji bo lawazkirina bandora kurdan li ser dewletên dagîrker heya . gefxwarinê di her demekê de li kurdperweran dixwin . Ji ber vê yekê ew naxwazin kurd jîr û zana û pêşkeftî bibin . çî di pêşerojek dîr û çî nêz de. Ez dixwazim bêjim pirsgirêkên kurdan mîna hemû pirsgirêkên li cihanê bêserûber na mînin. Mixabin, ezmûnê bi awayên cûrbicûr

destnîşan kiriye û nexasim li welatên ku kirîza a bi navê bihara erebî bi ser de rijîya , pirsgirêka ku nahate çareser kirin bû sedema bêtarên mirovî. Ev yek pkk dixwaze ku li herêma kurdistan bête li darxistin . Em bawer dikin ku çareseriya pirsgirêkên hevpar bi baweriya a bi siyaseta herêmê ye. Û erkê her yekî ji me ye ku em vê herêma nûjnava dibe, biparêzin.

Çarenivîsa Eyn Îsa nediya e

Kurdistan- Mistefa Emo

Ev demeke behsa rêkeftinekê di navbera Rûsiya û Hêzên Sûriya Demokrat HSD li ser radestkirina bajarokê Eyn Îsa tê kirin, tevî ku HSD ev yek red kir û dazanîn ku ew vî bajarokî radestî rejîma Esed nakin. Hin çavdêr dibînin ku dê Rûsiya rê bide Tikriyê da ku derbasî bajarokê Eyn Îsa bibe û mîna Efrînê control bike. Ev yek jî di demekê de ye ku êrişên grûpên çekdar bo ser rêya M4 û Eyn Îsa û gundewarê

wê berdewam e. HSD Tikriyê bi wê yekê tometbar dike ku pabendî rêkeftinan nabe û ji Rûsiya dixwaze fişarê li

Tikriyê bike daku êrişan rawestîne. Mihemed Cuma wiha li ser vê mijarê dibêje, danûstandinên Kurdî- Kurdî û rêkeftineke

bihêz ligel Amerîka dê rê li ber êrişên grûpên ser bi Tirkiyê ve rawestîna e, û nahêle Tirkiyê êrişeke nû encamp bide mîna

Serêkaniyê û Girê Sipî, lewma divê HSD şaştiya Serêkaniyê dubare neke û divê danûstandinên Kurdî Kurdî biser bixe heta ku ti xakeke din jidest nede. Semîra wiha dibêje, heta niha tik es nizane rêkeftina HSD ligel Rûsiya û Amerîka derbarê Kurdîstana Sûriyê çî ye, û divê ev rêkeftin werin zalalkirin da ku xelk naveroka wê bizanin, û divê Kurd bi yekgirtî biryareke yekalîker di vê derbarê debidin, ji berk u îro Eyn Îsa sibe egere bajarên din yên Kurdî bin.



Barzanî



Mustefa Hemdî

Barzanî Bilind e
qedir û meqam
Fêrbûn pir yê xwendevan
Wê saliyate di wê zindan
Tirsa dijmin ji navê giran
Xêrxwaz û mêrxasê Kurdan
Bab û bira zincîra mirovan
Lewra cotkar li pê man
Şoreşên rewa dijî dijminan
Seyda û bavê mezin
Di şoreşa çil û pêncan
Erdheja rêjîma Iraqê
Bi tifiing û pênuş û bi ziman
Kurê Şêx Mihemed
Kurê Şêx Abdilselam
Mela Mustefa Barzanî
Serkirdê Şoreşa Eylûn
Sibate xweşbe Kurdistan
Milet û serok û qehreman
Birîndar û şehîdên man
Rêkawe girtî
Nayê berdand
Welatê hezkiriyê bilindan
Nerazîbû pêvî Kurdistan
Mêranî di şer û cengan
Mirovê azadixwaz her man
Kurdo tu merde wek tavê baran
Şûr u tifiing û bi rextê li milan
Berzanê nemir çav reşê çiyar
Rêbaza serfiraziya Kurdistan

Dayê

Mesûm Bîco

Dayê silavek tevde gul
Ez rêdikim bo te ji dil
Dayê spaskarim hezar
Caran ji dest û dev û dil
Kî weke te her dem û gav
Bo min hilandî derd û kul
Dayê çiqas kar û xebat
Bo min te kir dil bi şewat
çend şev reş û salên dirêj
Diçûne yek dîtir dihat
Çav nêr û her dem guh li rê
Te dil dikir bo min civat
Bi derz û çirokên şevan
Dîlok û serpêhatiyar
Kar û xebata dest û pê
Xweş gotinên dil û ziman
Ger dil bi kul û dev li ken
Winda dikir derdên giran
Dayê dibistana mezin
Zanîn û aqil dane min
Comerd û zana dev li ken
Mêrxas û gurçik ji hesin
Pêxemberê me gotiye
Yezdan li quraana mezin
Berî diyê kes tineye
Buhîşt di bin ligan de ye
Eger mezin bibin gelek
Her dê û bav li bal teye
Nebêje wan "ofê" ticar
Gotin di quraanê deye
Dayê dibistana bilind.

12 sal bi ser koça dawî ya Hunermend Hiznî Bavê Adil re derbas dibe

Kurdistan-
Alan Ebdula

Hunermend Hiznî Bavê Adil ku navê wî Hiznî Selîm Hecî Hisên e û di sala 1932an de li gundê Herem Şero di navbera bajarê Qamişlo Amûdê de jidayik bûye, û li ser destê Eliyê Simê fêrî saz û stranê bûye. Dema navê Hiznî Bavê Adil tê guhê mirov yekser hunera Kurdî û foloklor û kelepûr bi bîra wî tê. Vî hunermendê mezin foloklorekî zêde ye Kurdî ji windabûn û nemanê parastî ye û gihandiye nişên nû. Hiznî ji malbateke oldar bûye, û koka wî vedgere Şêx Cibir û vê yekê hiştiye ku di destpêkê de bavê wî Tembûra wî sê caran li ser hev bişkîne da ku li sazê nede, lê wî berdeyam kir û ev yek jêre nebû rêgir.

Hiznî Bavê Adil, hunermendê mezin Yûsifê Çelebî nas dike, ku roleke wî ya zêde li ser jiyana hunerî ya Hiznî hebû, û herdem ligel hev bûne û hemû stranên wî ezberê kirin û bi amant ji bo guhdarên Kurd veguhestiye. Em Dikarin bibêjin Hiznî Bavê Adil pirek bû di navbera du nişan de û roleke



wî ya hêja hebû di parsatina stranên Kurdî ji neman û windabûnê, ku heta niha ev stran hêj mane û xelk jî gelekî pê kêfxweş in.

Wek tê zanîn jî ku Hunermend Hiznî Bavê Adil jêdereki giring bû ji bo Lêkolîner Celîlê Celîlî ku derdora 100 stranên foloklorî jê wergirtiye û di nava pirtûkekê de bicih kiriye.

Amûra wî ya tembûrê jî 14 distan pêk dihat, di ahengan de kêfeke zêde di xiste dilê hezkeriyên xwe, û wî ti bafle û amûrên din bikar nedianî, û wî bi tiliyên xwe li saza xwe dida, car caran xwîn jî ji tiliyan dihat.

Ebdulselam Omer wiha li ser Hiznî dibêje: Di dema ku Hiznî bavê Adil li gundan distra, û govend digeran, xelkekî zêde kom dibû, û ji hemû deveran diciyan da ku li stranên wî guhdar bikin û ji vê xweşiyê jî bêpar nemînin, bi rastî staylê Hiznî di dîlana Kurmancî de yan dîlana milan heta niha berdeyam dike û gelek hunermend li ser stayla wî dimeşin, Hiznî kaniya hunera Kurdî ye, di dîlana Kurmancî de dibistanek bûye û gelek hunermendan jî vê kaniyê vexwarî ye.

Hewlêr



Emel Hesen

Çendî durî tû Şêrîn î
Reng ji evîna Mem û zîn î
Tu roheyvî, tu roziv î
Tu Sîmavî, tu lîloz î
Roka sibê tava te ye
Çolu û çiya bejna te ye
Dijle û Ferat guliyên te ne
Mêrg û kahî Çavên te ne
Gul û giya bêhna te ye
Bihara xweş sînga te ye
Hizreta min dîtna te ye
Gernejîna lêvên te ye
Jîn û jiyar ji qada te ye
Bêhna vîne ji eşqa te ye
Awazên dil ji caniya te ye
Hozana min bi navê te ye
Şal û Şapik li bejna te ye
Şûr û Mertal li newqa te ye
Desmala sor Mohra te ye
Ala rengîn Taca te ye
Serok Me'sûd Şahê te ye
Ew pêşmergê Kelha te ye
Qehrîmanê partiya te ye
Cengvanê xaka te ye
Ser Netewa bavê xwe ye
Xizmetkarê gelê xwe ye
Cangoriyê doza te ye
Raperîna xemila te ye